يساعد عمّه "عنصر الآسياش" على "بسطة"

لبوع الدخان، وحيثما ذهب عمّه للحملة،

سلّمها لوالد ديار الذي كان يعمل عليها

خارج أوقات الدوام. في ذلك اليوم ذهبت

ووجهت البسطة ثم جاء ديار باكرا، وليس

في موعده المحدد، واستلمها وعدت للبيت،

وما إن وصلت أمام الباب حتى سمعت صوت

الانفجار».

ويكمل وهو يتذكر تفاصيل ذلك اليوم

المشؤوم كما يحب أن يصفه: "عدت فوراً

وانتشرت ثلاثة أشلاء من تحت الأنفاس،

وحملت أحدهم ظنًا مي أنه حفيدي ديار

الذي أنا دربه أبني، وحملهانه لشفيقه حاجي:

ال العسكري، ولكن تبيّن أنه ليس هو، وبقينا

نبحث طيلة اليوم في الماشي وبين الأنفاس

دون جدوى. وفي اليوم الثاني عثنا بين

الأنفاس على نصف الوجه وبعضاً من أجزاء من

عليهم البناء، هي ومارأة أخرى أياً باسم

نافقة، وبعضاً القطع الحديديّة من دراجته.

نائماً في مقبرة الهمالية، وصادف يوم دفنه

زوجتي".

وغربت ترك قامشلو منذ سبعة أعوام، وحن

إليها، تذكر شوارعها وسهاراتها وجلساتها

سوق حلبي لشراء بعض الحاجيات اليومية

للمنزل، وقالت لقد تركت البنات وهن نائمات

من مواليد سليمان مواليد ١٩٨٤ ثم لثلاثة بنات

(سياف، روکسان، لیلاس) يتحدث زوجها

بوسف شديد عن زوجته الشهيدة المفقودة،

الموطن غسان عصمت درويش الذي يشغل

منصب مدير دائرة نقل الكهرباء في المحافظة

بالأمس، وحالما بحثت الآلية في المكان المذكور

ووجدها بجرحه بليغة، يتحدث عن ذلك

والوالدة بجهة أخرى، وإمام موبايله ولا يتابعه،

ويده تحت رأسه، وأمامه يسرد قصة لأحدهاده،

اما جميع الموظف عاطي أحمد موسى

وهو مواليد ١٩٥١، وكان يعمل مستخدماً في

مدرسة موسى بن نصیر، متقدّعًا، متزوج من

اثنين، لديه ١٢ من الأبناء والبنات: «تقول

إحدى الروايات أنه استشهد وهو في طريقه

نحو ١٩٨٦ خريجة معهد الفنون النسائية، وهي

زوجة أخي خورشيد وكانت حاملة بابتها،

ويعطي بالقول: "اما أختي جنان عصمت

دوريش، فهي جريحة وقد كسر ظهرها

وأجري لها عملية تثبيت فقرات، لا تستطيع

تحريك الجزء السفلي من جسمها حتى الآن، ولكن

الأخرين ذهبتوا إلى العيادة، وأتمّوا العملية

وهي جريحة خارجية، وعمرها سبعون

عاماً، انكسرت رجلها البسيري، وعمرها

حوالى السبعين عاماً، وقد ركّبوا لها صفات

ثلاث بنات وابن، كبراهن خريجة كلية

الطب البشري، لديها جروح عديدة نتيجة

الشظايا، وقد تم استخراجها وعزلتها.

ابني عصمت الذي أخذني وانتشلني من بين

الأنفاس، كان هناك جرح في رأسه بطول

حوالى ١٤ سم إضافة إلى شظايا في رأسه

وصدره ويده، ووضعه الصحي مستقر الآن».

أن يلطف البحر أبناه وابنة، وتفقد بعد أشهر

قليلًا إبنة أخرى في التفجير، فهذا ما لا

يتحمله إنسان، يقولها الشاعر والمهندس

عماد حمدي بحسّرة: "ابنتي ليلى مواليد

وبياتي": هو من مواليد ٧/٢٩/٢٠٠٤ كان

يساعد عمّه "عنصر الآسياش" على "بسطة"

لبوع الدخان، وحيثما ذهب عمّه للحملة،

سلّمها لوالد ديار الذي كان يعمل عليها

خارج أوقات الدوام. في ذلك اليوم ذهبت

ووجهت البسطة ثم جاء ديار باكرا، وليس

في موعده المحدد، واستلمها وعدت للبيت،

وما إن وصلت أمام الباب حتى سمعت صوت

الانفجار».

ويكمل وهو يتذكر تفاصيل ذلك اليوم

المشؤوم كما يحب أن يصفه: "عدت فوراً

وانتشرت ثلاثة أشلاء من تحت الأنفاس،

وحملت أحدهم ظنًا مي أنه حفيدي ديار

الذي أنا دربه أبني، وحملهانه لشفيقه حاجي:

ال العسكري، ولكن تبيّن أنه ليس هو، وبقينا

نبحث طيلة اليوم في الماشي وبين الأنفاس

دون جدوى. وفي اليوم الثاني عثنا بين

الأنفاس على نصف الوجه وبعضاً من أجزاء من

عليهم البناء، هي ومارأة أخرى أيها باسم

نافقة، كان ذراوها وقدمها مهشمتان تماماً،

دفناه في مقبرة الهمالية، وصادف يوم دفنه


يوم عيد ميلاده».

مغترب ترك قامشلو منذ سبعة أعوام، وحن

إليها، تذكر شوارعها وسهاراتها وجلساتها

سوق حلبي لشراء بعض الحاجيات اليومية

تنفرد بنشر السجل BÛyerpress



مواليد 1994 متزوج
انضم إلى قوات الآسيويش في 15/4/2015



مواليد 1974 قامشلو، صيدلي خريج روسيا
له طفلين لم يعش على جثمانه



مواليد 1978 صاحب محل سوبر ماركت
على الشارع العام ، ومتزوج فوق المحل
أب لطفلين .



مواليد 1998 طالب بكالوريا،
استشهد داخل محل سوبرماركت "آمد"
العاذر لعنه والكان في موقع الانفجار
الإصابة كانت شظوية بالرأس
دفن في مقابر الهاشمية



مواليد 1962 تل شعير شيخان ، خريج
المعهد المتوسط للسكك الحديدية
1984 متزوج ولد ست أبناء



مواليد 1933،
استشهدت في عيادة طبيب الأسنان
د. صلاح أحمد



مواليد 1968، مفترض منذ 7 سنوات في ألمانيا
وكان في زيارة لأول مرة منذ ذلك الوقت
له ثلاثة أبناء



رضيع عمره عشرة أشهر
أمه الشهيدة بيان عبدي صاروخان
البيت فوق محلات كمال كوره.



مواليد 1931



مواليد 1969 مهندسة مدنية خريجة 1996
موظفي في قسم الموارد المائية
متزوجة لها أربعة أبناء اثنان منهم
أطباء



مواليد 1984 اختصاص جراحة عظمية من
جامعة اللاذقية، كان نائماً في القبو
تحت محلات كمال كوره



مواليد 1997 طالبة في كلية
الطبي البشري في جامعة دمشق
كانت نائمة في القبو
تحت محل كمال كوره



مواليد 1976، كان يملك محلين على
الشارع العام وهي تسجيلات ومحل كمبيوتر
متزوج ولدتين



مواليد 1964 متزوج ولد ابنتان وابن
موظفي في الخطوط الحديدية السورية
رئيس فرع الديوان



مواليد 1955 بيته فوق محلات كمال كوره
عثر عليه في اليوم الثاني تحت الانقاض



مواليد 1959، كان يعاني من مرض نفسي مزمن
وكان عاطلاً عن العمل بسبب بنائه الضعيفة
له أربعة إبناء شباب



مواليد 1994، من أعضاء "قوات الآسيويش"
كان الحرس المناوب يومها



مواليد 1985
لها ابن شهيد 10 أشهر
عبدالكريم نذير شيخ موسى



دفراز بدران يلدريم



مواليد 1958 زوجة الشهيد عبدالكريم أحمد شيخموس



مواليد 1993، استشهد 8 أفراد من عائلتها
تسكن فوق محلات كمال كوره



مواليد 1983 كانت في طريقها إلى
الدوام في بلدية قامشلو الغربي



مواليد 2010، قبل عام غرق أخاهما و اختها
في بحر ايجا اثناء توجههما الى اوربا



قيادي في حركة المجتمع الديمقراطي
عضو لجنة العلاقات البوليساراوية لحركة
المجتمع الديمقراطي في الخليج العربي
الاسم الحركي : بولات هرکول



مواليد 1996، الابن الوحيد ، كان مقرراً
زواجه بعد شهر



مواليد 1961،
أصيب بجروح أثنتان عوذه من عمله
نقل الى المشفى و تحسنت حالته
توفي بعد عشرة أيام من الانفجار اثر
تدحر حالته الصحية



مواليد 1984. موظف فني في شركة المياه
كان عريساً، يقوم بتوزيع بطاقات حفلة العرس
عثر عليه بين الانقاض مقابل صيدلية جوهر
كان موعد حفلة الزفاف بعد التغيير بيومين

الذاتي لشهداء تفجير قامشو الإرهابي



بيرقان سعيد أبواهيم



مواليد 1986 خريجة معهد الفنون النسائية زوجة الشهيد خورشيد كانت حامل بابنهما، قذفها التفجير من الطابق الثاني إلى الشارع العام.

بـ



هيلين توفيق رسول



مواليد 1993، مخطوبة



جوان خضر محمود



متزوج منذ 5 أشهر، ليس لديه أولاد الشق عن الجيش النظامي وانتسب للأسايش منذ حوالي سنة ونصف لديه آخر مفقود في حمص منذ حرب القصير كان في الموقع لحظة التفجير، عثر عليه أشلاء

بـ



سائق تكسي من قرية "نيف" لم يعثر عليه كما لم يعثر حتى على التكسي



هيثم عز الدين يوسف



ديار خالد شيخموس




مواليد 29/7/2004 عثر على أسلاته في اليوم الثاني بين الانفاس و دفن في يوم ذكرى ميلاده

بـ



مواليد 1983، كانت حاملة بتوازن وهي أم الشهيدين ريم و عبد الكريم شيخ موسى

بـ



مواليد 1951، مستخدم في مدرسة موسى بن نصیر، متلاعنة

بـ



مواليد 2002 قرية هيما كان مع والده في السرвис القادم من هيما

بـ



مواليد 2/4/1980 ، لها ثلاثة بنات لم يعثر على جثثهن

بـ



نافيا حسين عبد الرحمن



مواليد 1966، أم لأربعة أطفال كانت في مراجعة لعيادة طبيب الأسنان حين حصل التفجير

بـ



ولات عبدي محمد



مواليد 2003 كان يعمل في محل الألمنيوم " محل وسام" صدف خروجه من المنزل أن يتزامن مع موعد الانفجار

بـ



رامون وليد مشعل



مواليد 2001 طالب أول ثانوي كان يعمل في ستوديو ميديا كان متوفقاً في دراسته

بـ



أفين صلاح حسين



مواليد 10/8/2007 كان مع والده في السيارة متوجهين إلى مطحهم الخاص بالاتصالات

بـ




مواليد 1964



مواليد 2001، كان يعمل من شهر في محل كمال كوره للمرطبات

بـ



هنوفة فرحان عنز



مواليد 1986 كانت في السرвис القادم من هيما

بـ



فاطمة يوسف سليم



مواليد 1968 من قرية هيما، كان برفيقه ابنه فواز وصلوا مكان الانفجار لحظة حصوله

بـ



مواليد 1957 من سفيرة، معلم مدرسة وكان سائق الفوكس القادم من قرية هيما

بـ



محمد عبد المحسن أوسى



مواليد 1987، يعمل في محل "رستم" للموبيليا انفجرت المولدة و خزان الوقود مما أدى إلى احتراقه



Rû2

Nivaskar û Forevane
Kurd Konê Res ji
Buyerpress re.

Rû4

Gotar
Zilamé Merhê Bî!
İdris Hiso

Rû4

Gotar
Canda Dimopratîve
Mihemed Zekî
Mihemed

Rû5

Bijartî
Hebeştin Bijartî..
Şerîn Bozan

Aram kurê Dikran Melikyan e, di sala 1934'an de li bajarê Qamişlo, di nava malbateke hejar de hat dinê. Karê xwe yê hunerî bi evînek tiji his û xwesî ji temenê 18 saliyê de, di nava dewat û şahiyên Kurd û Ermenyan de da dest-pêkirin. Bavê wî di karê stran gotinê de bandor lê kir ku riya hunerê bidomîne. Sala 1966'an bi malbata xwe re berê xwe dan Ermenistanê û heyâ sala 1985'an di Radyoya Êrivanê de mîna xebatkarekî fermî xebitî.


Di sala 1990'ı de wek penaber çû Ewropayê. Di roja 8ê tebaxa 2009'an de li Atınayê (paytexta Yewnanistanê) koça dawî kir. Di qewîtiya xwe de, ew ì dixwest ku li bajarê Amedê were veşartin, lê hikûmeta Tirkîyê nehişt ku qwîtiya wî bi cih were, li ser vê biriyarê serokê şaredariya bajarê Amedê Osman Baydemir, kulmek ji axa Amedê bi xwe re bir û çû beşdarî merasîmê veşartina Aramê Dîkar bû, û li ser gora wî sekinê û got: "Aramê Dîkran wê rojek were ku em te bibin Ameda te, niha ji te re hinek ji axa Amedê"!!

Nemir Aramê Dikran di nava civata Kurdan de tê bihistin. Li Kurdistanê kesê ku dengê tiji eşiq û evînê wî nebîhistibe, tineye. Kurmanc, Soran, Zaza, Loran, Goran û hemû Kurd wî û evîna wî li ser Kurdan nas dikin. Sedem jî ew e ku bandora deng û stranê wî li ser dil û mejîyê mirovan bandorek taybetî çêdikin. Yek ji dengê ku hertim para kurdî ya Radyoya Êrivanê di nava Kurdîn her çar perçen Kurdistanê de dihat guhdarkirin, dengê zelal ê Aramê Dikran e. Dengê ku ji kûrahiya dil derdiket û evîn û heza bêdawî ji bo rûmeta bilind û jiyana bi şan û şeref diafirand.

Lê di vê navê de pirsa herî girîng ji bo Kurdan ev bû ku Aram Dikran ê Ermenî çawa wiha ji dil û bi şewatek tiji soz dikare stranê kurdî bixwîne? Çawa dikare wiha li ser bedewiya deşt, zozan, dol û newal, mîrxas û egîdîn Kurdan bistire? Aram kî ye ku nekiyi bin bandora siyaseta wan xwînmijen ku her tim dahola neyartiya kurdî û Ermenian lêdixistin û neteweya kurdî bi wê hîndê tawanbar dikirin. Lê famkîri na siyaseta çewt a dagirkerên Kurdistanê ji mêj de bû ku di malbata Aramê mirovez de hatibû famkirin. Aram Dikran bi xwe di vê derbarê de wiha dibêje:

ARAM DÎKRAÑ
1934-8/8/2009

GELÊ KURD DEST BIDIN HEV



Bavê min jî mîna gelek Ermeniyen din di çaxê tevkuijîa Ermeniyan de bi riya Kurdan ji kuştina bi destê Tirkân hat rîzgarkirin. Ji bona wê jî her dem ji min re wiha digot: Kurê min qedir û qîmetê gelê kurd bizanibe, Kurdan ji bîra neke, mineta wan li ser min pir e, zehmetî û xwêdana wan li ser min pir e. Ewan min xwedi kirine û ger hûn çar bira û du xwîşik vê gavê li ser rûyê dinê dijin bi xêra Kurdan e ku hûn dijin. Heke dijmin min bikuşa, hûn jî nedihatîn rûyê dinyayê. Ew axayê kurdî ku cend salan bi nihêni ez di mala xwe de xwedî kirim û pişt re ez şandim Binxetê.. Bi stranê xwe zimanê kurdî bilind bike, û van helbesten ku ez didime te bike stranê xweş. Tu bixwe jî bibî dostek baş ji Kurdan re"

Bi vî awayî Aram, li herderê bi birayê xwe yên kurd re jî û şireta bavê xwe yê mirovez heyâ roja mirinê ew ì jîbir nekir. Sala 1966an gelek Ermeniyen ku li welatê Sûriyê dijin, vegerin welatê bav û kalên xwe Ermenistanê. Li wir bû ku Aram bi hevkariya Xelil Muradov ku berpirsyarê para kurdî ya radyoyê bûn, bi awayekî berfireh dest bi karê xwe yê stranbêjîyê kir. Carek din jê re hat îsbatkirin ku kurdî li her derê mîranî û mîvanperweriya xwe wenda nakin. Li wir bû ku Aram evîndarê stran û awazîn kurdî bi hevkariya Cemîla Celîl û Keremê Seyad bêtir ket nava deryaya stranê kurdî û bi melevantiya di nava vê deryaya bêbin de bû hosta û şehrezayekî pispor.

Awaz û helbesten wî ji nava dilê civata Kurdan derketine. Ki ye ku strana "Bilbilo" nebîhistîye û Kurdistana bindest û bextreşiyê gelê Kurdî li ber çavê wî zîndî nebin? Kîjan evîndar e ku strana "Keçê" ji bona te ez dîn im" bibhîse û hêsrîn evîndariya bi şewat nebarîne?!

"Stranê Hey lo lo delal", "Şev çû", "Çiyayê Gabarê", "Zilan", "Dîcîm-dîcîm", "Bi hesreta Êrivanê", "Çil-çil kezî", "Ey welato em heliyan", "Elmasa min ji dersê tê", "Ax dê û bavê me" û bi dehan stranê din bi riya Aram Dikran ketin ser zimanê gel û ji Kurdan re bûn samanek netewî ku di nava rûpelîn dîroka hunerê de nayê wenda kirin.

Herkes nikare muzikê bi guh-darênen xwe bide hezkirin. Ger hunermend bi deng û awazîn xwe di vî karî de biser nekeve, nikare muzika xwe mîna xwarîna riha mirovan, pêşkêsi gel bike. Silav ji giyanê Huner-mendê mirov hez Aramê Dikran re..

Nivîskar û Torevanê Kurd Konê Reş ji Bûyerpress re:

Dixwazim li goristana Hilîliyê, di navbera Qamişlo û Nisêbînê de bême veşartin.

- Fen û xapên siyasetê nizanim.. Di vê rewşa girikî de nizanim milevaniyê bikim..

Naxwazim zengilê rôexistinan bim..

- Zimanheziya min di naŞibûn û xortaniyê de ji gundê min Doda û trajidiya gelê min destpê kir.

- Mir Celadet Bedirxan wek kaniyek ava zelale û ez wek tîkî wê avê me, çendî ji wê avê vexwim kela min hênik nabe..

- Mixabin gelek ji helbestvanê me yên nûjen, nizanin helbestên kilasik binîvisinin, dibêjin: Em helbestên nûjen datinîn.

- Qamişlo ev bajarê ku ez di nav kolan û sikakêñ wî de mezin bûme, nikarim dûrî vî bajarî bikevîm.

◦ Di serî de em dixwazin ku Konê Reş ji nêz ve nas bikin, nexasim ji bo nifşê nû?

Nivîskar û helbestyanekî Kurd im. Navê min Selmanê Osmanê Abdo ye. Sala 1953'an li gundê Doda, nêziki Qamişlo çebûme..

Di malbateke Kurperwer, zimanheziya rewşenbirê de mezin bûme.. Ji mîj ve min hez ziman, folklor û toreya gelê xwe kiriye.. Û wiha gelek berhem û gotarê min di kovar û rojnameyên Kurdistanî de hatine weşandin û 20 pirtûkîn min hatine çapkirin.. Bi serketin di her çar perçeyen Kurdistanî de hatime naskirin..

Yekem ji wan kesen pêşî yên ku di van sih salen dawi de li Binxetê bi zimanê Kurdi nivîsandîye. Hêji bikar û barêñ xwe yên nivîsandîna bi zimanê Kurdi berdewam im. Ez hebûna gelê Kurdi di hebûna zimanê Kurdi de dibînim û her dem dibêjin: Zimanê me diroka me ye.. Hêvi û daxwazîn min ev in; ku her sibeh rojnameye Kurdi bi tipen Latinî li ber deriyê mala xwe bibînim û bi rêka wê nûce û bûyerên Kurdistanî û cihani bixwinim.. Bi gotineke din ez: Miroveki Kurd im.

Ji sala 1514 an ve

Ta roja iro;

Di kul, êş û janêñ

Gelê xwe de diponjim.

Xemxur û zikêşê

Zimanê dê û bavê xwe me;

Yekim, ji wan kesen ku,

Li dor malbata Bedirxanîyan

Dixeprîm.

Ez Konê Reş im

Miroveki Kurd im..

◦ Di kîjan temenî de, hestê netewî li rex Konê Reş hatjenandin, anku we xwe kengî nas kir ku hûn Kurd in, zimanê we qedexe ye?

Nizanim ev Kurperweri û hezkirina ziman Kurmancî ji ku bi min re çebû! Bav û kalen min beşdarî di ti Şoreşen Kurdi de nekirkirin.. Li gor ku tê bira min behsa zulm û zora tîrko dikirin û cudabûna xwe ji Tîrk û Erebân bi zimanê Kurmancî nişan didan.. Di odeya bavê min de bi mereq li çirokên Memê Alan, Siyabend û Xecê, Evdalê Zeynê, Restemê Zal, Mir Miheme, Xandimdimê Çengzérin, Pîra Sehîrdar û çirokên mirekên Botan dihat guhdarikirin.. Kesi ji gundiyan bi zimanê Erebî nizanibû ji bili melayê gund pê ve, Erebîya wi ji a Qurâne bû, dema ku bi cendirmeyen qereqola gund re xeber dida, neferen qereqolê bi Erebîya wi dikenîyen.. Di wê çîkunîyê de ji min werê xelkên dînyê tev bi zimanê Kurmancî xeber didin.. Ji min werê ji zimanê Kurmancî pê de dînyê de nine.. Û wiha em di nav agirê du zimanan de dihatin Şewitandin.. Ji Bakur ve Tîrk û zimanê Tîrk bû û ji BaŞur ve zimanê Erebî bû.. Me di navbera Xelil û Celîl de li ber xwe da.. Me bi zimanê Erebî xwend û di gel re ji zimanê xwe parast.. Bi rasti qencya vê parastinâ a pêşî li dê û bavê me vedigere,



li civaka me a gundîtiyê vedigere..

Erê keko! Zimanheziya min di naŞibûn û xortaniyê de ji gundê min Doda û trajidiya gelê min destpê kir.

◦ We despêkê berê xwe da nivîsandina ci cureyên nivîsandinê?

Di baweriya min de kurdevariya resen, hezkirina zimanê Kurdi di hinavê mirov di diçine.. Bi gotinek di Kurdevari û zimanheziya wek werisê ji du benan hunandi be, yet bêyi yên de nabe.. Û di her tiŞti de destpêk bi hezkirinê destpê dike û hezkirina durist û aktiv mérani ye.. Sebareti hezkirina min ji zimanê Kurdi re dikarim bibejim ku ji gundê min Doda destpê kiriye, ev gundê sinorî ku li ser sinorî Sûriyê û Tîrkiyê dikeve, kesi jê ne bi zimanê Erebî û ne bi zimanê Tîrki zanibû û bi demê re di nav agirê van her du zimanan de dihat Şewitandin.. Wiha di nav wê trajidiya zimanî de mezin bûm û min xwend û bi gîyanekî Kurperweri hatim xwedikirin.. Di sala 1973 an de min diwana Cegerxwîn (Kîme Ez) peyda kir û çend careki bi Cegerxwîn re rûniŞtim, hingê min ji wek tevayî nifşê xwe, hin caran bi zimanê Erebî helbest dinivisand.. Lê piŞti ku min Cegerxwîn dit û jê pîrsî Seyda tu bi Erebî bêtir kare his û hestê xwe derine an bi kurdi..? BeŞîŞî û li min vegardan û got: Bi Kurdi.. Ji wê hingê ve nivîsandina bi zimanê Kurdi nîquî dilê min.. Di sala 1977an de bo xwendîn çûm Almaniya Rojava, li wir bi Şahi çav rojnameye (Roja

Welat) ketim, bi Kurdi û Tîrki bû.. PiŞti vegera min di sala 1978an de, min dest bi nivîsandina Kurdi kir, belê di pileyek biçûk de bû.. Bi hatina ronakbirên Kurd re ji Sovyeta berê wek: Celîl Celîl, Ordîxanê Celîl, Eskerê Boyîk, Elyîv Eydilrehman Tosinê ReŞid.. Şeranîya zimanê Kurdi û danheva zargotina kurdi bêtir bi min re mezin bû û wê hingê, di rîka Eskerê Boyîk re çend careki helbesten min di rojnameya (Riya Taze) de belav bûn.. Di orta salen 1980i de hin caran berhemên min di kovara (PêŞeng) de belav dibûn, ewa ku partiya rehmeti Samî Ebdulrehman li Sûriyê diweşand.. Belê di sala 1988an de min bi rengeki aktiv bi kurdi nivîsand û di Newroza 1989an de min û hevalê xwe Abdulbaqî Huseyîni Kovara (Gurzek Gul), bi Kurdiya Latîni weşand.. Dikarim bibejim ku ta niha min di ser 50 kovar û rojnameyên Kurdistanî de nivîsandîye.. Di warê nivîsandina gotaran de ez ji TîR a Musa Anter a ku di rojnameya WELAT de li Stenbolê dihat weşandin û ji BEXÇE yê Kemal Burkayî ku di rojnameya RONAHÎ de, ew ji li Stenbolê dihat weşandin fêr bûme û wan wek mamoste ji xwe re dibinim di warê nivîsandina gotaran de, jîxwe kîfxweş dibim ku Şagîrteki Mir Celadet Bedirxan bin.

◦ Gelo bandora jiyan û xwezaya gund li we kir hetanî we berê xwe da nivîsandinê?

Dibistana min ya pêşî gund û bênderen wê bûn.. Ez ji wan fêri zimanê Kurmancî, çirok, çivanokên folklorî, mamik, gotinên pêŞiya, yari, lîztk û hejmaren lîztkên zarakan bûm.. Ta roja iro, gelek ji wan di bira min de ne, min ew ezber kirine.. Béguman rola jiyanâ gundîtiyê geleki li min heye û mezin e.. Bi saya gund min semyanekî mezin ji gotinêñ kurdi yên orjinal di tûrikê xwe de kom kiriye û bi xêra erdnîgariya gundê min yê sînorî destpê û bingehê nivîsandinê bi min Şerîn bû..

◦ Çima te bi zimanê Kurdi nivîsand?

Ji wan kesen ku bi zimanê Cizîri, Xani û mir Bedirxanî Boti diaxinfin.. Ji bo xelkên Qamişlo, Efrînê, Amedê, Sérêtê, Zaxo, Duhokê, Ormîya û Mehabadê.. Ji bo wan lehengên ku xwîna xwe di ber azadiya welat de rijandine û dirjinîn, da ku careke din berfa li ser çiyây Agri, Cûdi, Barzan û Piremegrûn, bi xwînê sor nebe.. Da ku keç û xorten û belatê birindar bi aŞti û arami bijîn û her yek ji wan li ser Memê xwe, Siyabendê xwe, Zîna xwe, Xeca xwe stranan bibeje û Edûla Temir PaŞayê Milli, bê tirs li ser DerwêŞe Evdi binîhirine.. Erê, ji bo gul, kulilk û nêrgîzen Kurdistanê,



Hepveyvîn: Ehmed Bayê Alan

min zimanê Kurdi ji xwe re neqandiye.. Ji bo wan kesen ku ji zimanê dayka min fam dikin.. Ewê ku, ez û wan bi yek Sûri radibin û bi yek Sûri dikevin.. Ewê ku ne ji wan be ez tune me û hebûna xwe di hebûna wan de dibinim.. Ji ber yanek min nivîsandina bi zimanê Kurdi bijartîye.

◦ Çima we navê Konê Reş li xwe kir?

Sebareti naznavê min (Konê Reş); ev naznav, kalkê min (Ehmed), anku bavê min yê ku di heyamê xwe de mixtarê gundê Doda bû, wî, ev nav bi wateya sexibûn, mérani û dîlfirhebûnê li cîranê xwe Ehmedê Pitê kir.. Ehmedê Pitê, miroveki feqîr, kommerd û sexi bû, deriyê wî her dem vekir bû.. Hem ji, ji zimanê Kurdi pê ve bi ti zimanan nîzanî bû.. Miroveki bi cil û bergen kurdi yên orjinal girêdayî bû; kum û kolozeki reş li serê wî bû.. Vi miroveki gelek çirokên kurdi yên folklorî zanibû.. Berê, ez di vî nav de diponjim û min hezê dikir.

Bijartina min ji vî navi re bi gelek wateya ye; ji rexeki ve, reŞahiya ku wê demê konê xwe di ser welatê me re vegirtibû.. ji rexeki din ve, Kon her dem vegirtiye.. Kon, mirovan ji sermî û germî diparêze.. Kon bi vegirtina xwe xuya ye, rîwi, birçi û hejar xwe lê digirin, di bin siya wê de xwe ji germî û sermî xwe diparêzin..

“Ji pirbûna Yekîtiyên nivîskaran yên rôexistinan ku piraniya endamên wan xwe helbestvan dibînin..! Di vî heyamî de helbestvanê ku bi kurdî an bi Erebî dîniyîne û nikaribe gotarekî bi wî zimanê binivîse, şermek mezin e..! Ji xwe berberiya ku di nav nivîskaran de heye, nayê gotin..! Van yekan ez dûr hiştîme.. Ez li nivîskaran digerim..!”

◦ Di heyamê we de, kî bêtir nivîsandin dikir, û we ji kê re dixwend?

Bi rasti, min û hevalê xwe Abdulbaqî Huseyîni bi kovara (Gurzek Gul/1989), kîrash kevin çîrand û me berhemên nivîskarênu hebûn û bi kurdi dînivîsandin di kovara xwe de diweşand.. Ji yén ku bi kurdi dînivîsandin û navan tê bira min ev bûn: Xelîl Sasûni, Hadi Behlewî, Seydayê Tirê, Yusûfî Berazi, Rezoyê Osê, Salihî Heydo, Ehmedê Şêx Salih, Mehîmûdê Sebrî, Deham Ebdulfettah, DerwêŞe Xalib, Ferhadê Çelebi, Diya Ciwan, Dilawerê Zengi, Qado Şerîn, Tengezár Marînê, Dildarê Midî, Siyamend Brahim, Heybet Bayê Helebce, Fewaz Evdê, Xalid Cemîl Mihemed, Kamîrânê Haco, Mûsa Zaxurani, Eziz Xemcîvin.. Li Helebê ji ev kes hebûn: Pir Rustem, RûxweŞe Zivar, Selah Henan, Eli Cafer, Mihamed Hemo, Heyder Omer, Dr. Abdulmecid Şêxo, Melyâvê Kurdi.. Ji ber bandora me, hina ji nivîskarênu bi Erebî dînivîsandin, berî xwe and nivîsandina bi zimanê Kurdi ji.. Ci pirtük bi kurdi an Erebî teketa ber destê me de dixwend, bêtir Dîwana Melayê Cizîri, Hawar, Ronahi û weşanîn baŞûr û rojnameyên ku li Europa dihatin çapkirin û digihan destê me wek: Armanç, Hêvi, Nûdem û geleke caran ji min di wan de nivîsandîye.. Xwendevan nebûn.. Bi rêka Guzeck Güleme kîrash û xwendevan peyda bikin..

◦ Em li ser psپoriya te di danehev û belavkirina dirok û berhemên malbata Mîrê Bota Bedirxanê Azîzî, û bi taybet yê Celadet, Kamuran, Rewşen Bedirxan, baxivin?

Bedirxanî ji Kurdan re Şoreşâ netewî ne, Şoreşâ rewşenbîri ne, diplomasîya kurdi ne.. Ez ne bawer im ku ti malbatan wek malbata Mîrê Cizîri Botan “Mir Bedirxan 1802 – 1868” ji dil û can kar, xebat û bizav di ber gel kurd de kirbin û tev male xwe û canê xwe di ber de wîndîa kiribin.. Mir Bedirxanî ku di sala 1843an de, di herêma Botan de mîrnîşiyek ava kir, pere bi navê xwe deranî û di bin navê “Peymana Piroz” de,


kurd li dor xwe civandin û belav kir û got: Din dinê Xwedê ye, em tev birayen hev in.. Û wiha biyaniyan di pesnê wi de gotin: “Bedirxan Edalet e û edalet Bedirxan e”

Tevi ku neferen vê malbatê ji sala 1847an ve di koçberi û sîrguniyê de dijîyan, lê wan qet welatê xwe Botan, warê bav û kalen xwe, ji bir nekrin, ji desthilan neketin, li ber xwe û gelek xebat û bîzav kirin, da ku navê gelê xwe di nav gelên cîhanê de bilind bikin.. Neferen vê malbatê di sîrguniyê de, di bin Şert û mercen zehmet û dijwar de, xwe berpîrsyarê gelê xwe diditîn û kîŞeya gelê Kurî barê xwe yê yekem dinasîn.. Bi gotin û kîrîne dixebîtin; ci di warê civaki û rewşenbîriyê de û ci ji di warê siyasi.. Belê hê ji navê gelekan ji wan neferan di tariyê de ye, wek nimûne.. Ebdulrezaq Bedirxan ku wek yekem diplomatê Kurî tê naskirin, di sala 1918an de li Mûsilî ji aliyê waliyê wê Silêman Nezîf ve hat bidarvekinir û di gorîstan biyaniyan de hat veşartin.. Kamil Bedirxan yê ku mejîyê serhîdana Bedîlisê bû, piŞti bidarvekirina mele Selîn û hevalîn wî xwe li Teblisî girt li wi libâstanek kurdi vekir.. Ü Behri PaŞa, Eli Şamil PaŞa, Sureya Bedirxan.. Wiha gelek neferen vê malbatê xebat û bîzav di ber kîŞeya Kurdi de kîrine, lê mixabin ta roja iro navê wan di tariyê de ye.. Wan Bedirxanîyan gelek komele û dibistan damezîrandin, gelek kovar û rojname weşandin, hem ji bi saya wan gelek navê û enstitü ji gelê Kurî re hatine ava kîrine.. Mesela Bedirxanîyan xelas nabe..

◦ We kengî û çawê têkîliyên xwe bi malbata Bedirxan re vekirin?

Di serê sala 1889 an de dema min û hevalê xwe Abdulbaqî kovarek bi navê (Gurzek Gul) bi tipen latini weşand, pêdivi bû ku ez li daner û berhevkiyê tipen kurdi latini bigerim û wî ji nêzik ve nas bikim.. Wê çaxê ji, ez li Mir Celadet Bedirxan rast hatim.. PiŞti pîrsyanan û xepartina li dor jîyanî wi, min seh kî ku kebîniya wi “Rewşen Xanîm Bedirxan” hêj sax e û li bajarê Banyasî jîyan xwe berdewam dike.. Min yek nekrin dudo û min xwe pêve gîhand.. Wiha ez ketim nav deryaya malbatê ku tev jîyan xwe di ber welat û mîletê kurd de terxan kîrine û tev di zîvarî û miŞextiyan de mirine.

Ez çawa bûme pispor di malbata bedirxanîyan de.. Dikarim bibejim; piŞti ku min Rewşen Xanîm nas kir û hûr hûr lê guhdari kir.. Wê kul û xemîn xwe, çiroka malbata xwe, miŞexti, zîvari û bêkesiya malbata Bedirxanîyan ji min re got û Şirove kir, min xwe dit ku ez wek pîsporeki me di warê malbata mîrekên Botan de..



◦ We

Çanda Dimoqratiyê

Demoqrati wegerandin e ji gotina Yonani "Dimokratik" e, wateya wê ji (Desthilatdariya gel) e, Şeweyeji Şeweyen desthilata dewletê ye, lêbelê bi wateya xwe ya giştî, Şeweyek di jiyanê de ye, ku her kes di wekheviya derfetan de xwedî par e, di jiyanâ civakî de ji beşdar e.

Bi wateye din, em dikarin bîbîjîn ku kari bin bi azadi beşdarîyê di standina bîryaran de, di hemi hîlîn civakî yê tîvîl de, bikin.

Ev têgê di naveroka xwe de komek ji pîvanan di nav xwe de dicivîne, ew pîvan di van peyvan de têne xuyanîkirin, reftar, nîrx, û bawerî.

Gellek lêkoliner dibinin, nîrxên ku bi demoqratiyê ve girêdayî ne, û hemû kes wan bikar tinin, di réya çanda wan re, di pêvajoya nîşen cihêreg re dîghêje wan, gîngirîtin nîrx ji ev in:

-Rêzgirtina beşdarîya giştî û parastina azadiya derbirinê.

-Her kes di ber karîn xwe de berpirsyar e.

-Guhdan bi mafîn mirovan, dûrkîtin ji kedixwariya kesen din.

-Pêkîna dadmendiyê di nav kesan de.

Ev nîrx û rewşen ku reftara kesan destnîşan dîkin, reftara mirovan bi van taybetmendian tê pesindan:

-Beşdarîya civakî û wek hev.

-Her kes ê beramberi xwe di wekheviyê de bipejrîne.

-Heger nakokiyek çebû, divê neghêje tundûtâtiyî.

-Her kes karibe di hestên û din de têbîge.

-Hin nakoki hene, bê vîna mirov diqewmin, divê mirov wan bipejrîne.

Di barê vê mijaré de, hin lêkolînê ku li ser perwerdekirina xêzanê ji zarokran re bûne em ê berbiçav bikin:

-Şewye desthilatdar (zoedest): Ew e ku dê û bav rô nadîn ku zarok nerîn xwe di mijarîn ku bi reftara wan ve girêdayî bin, derbirin, pêdiviyê xwe yêntaybet bi rê ve bibin.

-Şewye demokrati: Ew e ku dê û bav hestê beşdarîyê di gengeşekirina tiştîn taybet ên bi reftara wan ve girêdayî ye, geş û gur dîkin, teví ku bîryara dawi di destê bavan de ye, yan li ser erê dîkin.

-Şewye lêborînê: Ew e ku bandor û akama zarakan di standina bîryaran de ji ya dê û bavan bêhtir e.

Enacama van lêkolinan diyar dike, zarokênu di xizanê demokrati de perwerde bûne, di malen xwe de bêhtir bi erêni bi dê û bav xwe re diçin.

Fêrkirin û Reftara Demokrati

Bê guman e ku dibistan yekîneyeke civaki



Mihemed Zeki Mihemed

ye, hayemeke wê ya rîexistînî heye, ku dikare hestê çalakiya kesane li cem Şagirtan geş û gur bike.

Reftara yê mamoşte bingeha qayillbûn, tovîn afirandin, xweseri û kelecanîyî li cem Şagirtan saz dike.

Lê reftara mamosteyê zordest, beşdarîyê li cem Şagirtan qels dike, ramanê wan ji hev belav dike, rewşa wan a derûni tevîhev dike, û wan biber tengijandin ve dibe. Çi qasi asta hinbûn û zanîn bilind dibe, gengaz e ku civak bi ser demoqratiyê ve here.

Ji ber ku armançen perwerdekirinê neynika nîrx û pîvanen civakî ne.

Bê guman e, dema ku zarok jîdîyik dibin, ne dimoqrati ne, lêbelê ew pileyekê ji zanîn werdigirin berî ku em hîviya reftara demoqeqati ji wan bikin.

Ji ber ku nezanî sedemek sereke ye ji reftara ne demoqeqati re, di nav kes, girûp û neteweyan de, pêwîst e em agahîyî li ser nîrxen demoqratiyê û reftara demoqrati li ber wan deynin.

Zarok reftar û ciywaziyen mirovan dinasîn. ciywaziyen alkariya wi dike, ku çi ev nasin û têgîştina wi bi van nakoki di réya wi re bibûrin, dê bi qayilbûna her du aliyan çareser bibe.

Ev yek diyar dike, ku nezanî xaka bi rewa ya ji geşbûna hişbawerî û tundûtâtiyî re ye, lêbelê zanîn û zanîti ji hîmanen serekene ji reftara demoqeqati re.

Levra mirov dike, heger demoqrati di wateya xwe de têgeheke siyasi ye, lê ew di wateya xwe ya giştî de têgeheke civakî ye.

Heger em danûstandinê bi vê têgehe re nekin, û bi rola wê têneğihêjin, ta ku em qon-axa ciwaniyê derbas nekin, lê rehîn wê bi qon-axa zarokiyê ve girêdayî ne.

Heger reftara demoqrati cihgirti be di helwesten tîvîl de tê diyarkirin, lê, ew parek e ji sazkarinek berfirerît re, ew ji kesayeti ye.

Dema reftara civakî ya di civakekê de cî dirige, hingê mirov dike li ser çanda beşdarîyê biaxêve, ew ji çanda serxûzkirinê ya di civaka ne demoqeqati yan a zordest cuda ye.

Ji ber ku çanda beşdarîya civakî ji taybetmendîn civaka pêşketi ye, ya ku zagon di ser hemi rézik û rewîştîn civakî re ne, lewra her kes li ber zagonê weke hev in.

di vê demê
de û li gekek



Raid Mihemed

Li ser xaka vî welaflî, cara yekemîn şoreşa Homosabyans destpê kir û tîrîjêni mirovê aqilmendşewqaxwadacîhanê, herwiha Niyołotikkû 12000sal B.Z de di heman welaflî de hat destpêkirin, û mirovahîta niha ji berhemîn vê şoreşê jiyanâ xwe didomîne, şoreşa ku li ser destê jîna Kurd-Xwedawenda Star dihat birêvebirin, û bi vî awayîwelatê Kurdistanbûnavenda şarestanîya kevnar, mîna Ewropa ku îro bûye navenda şaristaniya sermayedar, ku hemî cîhan êşûazaran jê dibîne bûye bela serî mirovahîye.

Wisa xuya dike ku dîrok her dem, li pênavâ armancen pak

Zilamê Merhelê Bû!

"Axaftina Sekreterê partiyek Rojavayê Kurdistanê ji gora wî di roja bîranîna koça wî ya dawî de."

Xweska devê min geri-yaba, zimanê min ne pûc ba, destê min liviya ba, min dizanî serê vê sibehê çi ji we re bêjim, min dê zimanê we bî mikutan pelaxtiba. Min dê derewên we ji milet hîn bêhtir eşkere kiriba.

Ez ji wan têdighêm ku ez çendî têkoşer bûm, fikir û ramanen min li gund û bajarên welat belav bûne, bi sed hezaran kes û welatiyên welatê min bûne şagirt û mirîfîdînmin, baweriyawan bîrêbaza ku min daniye tê, rîbaza azadkirina welat e.

Di gotarê xwe de li ser gora min ji vê sibehê de behsa destkeftiyê ku min ji wan re pêk anîne dîkin, di gotarê wan de, ez Ristemê Zal û Derwîşê Evdî me, diya min min anî û pişt re qalibê mîrânşîkiya, di gotarê wan de ya serê vê sibehê serê min li kevirê gora min xist, ez ji nişkî ve ji xew rakirîm û anîn bîra min dema ez di nav wan de bûm ez çibûm û ci digitoin û niha ci dibêjin û hîsiran li ser gora min dîbarîn.

Xweska devê min geri-yaba, zimanê min ne pûc

tiştî ye û nizanim çi!

lê tevî wilo ez di gora xwe de dibhîzim ku ez pêsewa bûm, û heger ez niha sax bama wê halê milet û gelê me ne ev hal ba.

Ez ji wan têdighêm ku ez çendî têkoşer bûm, fikir û ramanen min li gund û bajarên welat belav bûne, bi sed hezaran kes û welatiyên welatê min bûne şagirt û mirîfîdînmin, baweriyawan bîrêbaza ku min daniye tê, rîbaza azadkirina welat e.

Di gotarê xwe de li ser gora min ji vê sibehê de behsa destkeftiyê ku min ji wan re pêk anîne dîkin, di gotarê wan de, ez Ristemê Zal û Derwîşê Evdî me, diya min min anî û pişt re qalibê mîrânşîkiya, di gotarê wan de ya serê vê sibehê serê min li kevirê gora min xist, ez ji nişkî ve ji xew rakirîm û anîn bîra min dema ez di nav wan de bûm ez çibûm û ci digitoin û niha ci dibêjin û hîsiran li ser gora min dîbarîn.

Wê dema ez li jiyanê bûm ezzidzanim we çidigotûdikir pistpist, lê we newêrîbû bi mîrânji min re bigota: "Bi

ba, destê min liviya ba, min dizanî serê vê sibehê çi ji we re bêjim, min dê zimanê we jê kiriba, min dê serê we bi mikutan pelaxtiba. Min dê derewên we ji milet hîn bêhtir eşkere kiriba.

Ez mirovekî welat hez bûm min li gorî zanebûna xwe xebat kir, min hewl da tiştekî bikim lê zanebûn û têgîştina min têra min nekirin ku, ez rîbazeke ava bikim û çareseriyeke ji milletê xwe re bibînin, ne tenê wîsîa min gelek caran astengî ji li pêşîya hin heval û dosten xwe çê dikirin, ji ber ez biser neketibûm min ne dixwest kes biser bikeve ji, gelek caran jîber ku em di nav milet de bê banor bûn me gelek rîkeftin jî ku di berjewendiya gelê me de bûn me ew xirab kirin jîbo ku kursiya min ji destê min neça heta ez bimrim, "Kursî xweşbû".

Wê dema ez li jiyanê bûm ezzidzanim we çidigotûdikir pistpist, lê we newêrîbû bi mîrânji min re bigota: "Bi



Idris Hiso

vî halî em ne partiyek mamoşte, de bila em li mala xwe rûnên heger ti kar ji me nayê." We wîsîa ne digot, mi ji we re digot: "Ne ji partiya me be, miletê me bi temamî wê winda bibe." We ji serê xwe dihejand kesî negot ev "Derew" e.

Hûn bi xwedêkin serê vê sibehê gotarê xwe zû bixwînîn û ev çend kesen ku bi we re hatine wan bi xwe re bibîn, min bi tenê bîhîlin û gunehê min neynin bîra min, carêminjixewranekin, û heger we ev kîla bi zimanê Erebî ji ber serê min rakiriba wêbaştırba, belkî salekêdu salan gora min jî winda bîba û we bes karîba rîbîn ser.

Vêja zû bikin heyrana we me zû bikin..!

20.04.2016

Qamişlo Baceya Neyekbûna Layanê Kurdî Dide

Di roja 27 heyva bûri 2 teqînên xwekuji li bajarê Qamişlo demîjmîr 9:25 yê sibehê rû dan li taxa Xerbi li néziki navenda AsayıŞê, di encamê de zêdey 50 kes jiyanâ xwe ji dest dan û hejmar di zêdebûne de ye ji ber ku zêdey 175 birîndar hene û hin ji wan birînen wan giran in, û gelek jêder dibêjin ku ew barhilgira ku hate teqandin ji çargoŞeya ewlehi derketiye bi taybeti ku tê zanîn ew cada ku bûyer li wir çebû qedexe ye ku otombelê mezîn yan barhilgîren mezîn di wê rô de herin û werin, û tiştî ku mirov di matmay dimêne ku bi ci rengî çawa çilo barhilgira pez karîbû derbasî vê devera qedexe bibe bê ku huşîarı hebe ji layê desthilatê!!!

Evpîseke xelqê Qamişlo pirs dîkin, bi taybeti ku navnda AsayıŞê û navendeke Rewşenbirî û çend navendê giring li navçeyê hene, ji ber çi Ewlehi hate Şikandin ...? Dibe yek bêje ku

û pîroz ji gelê Kurd dixwaze, li ser navê mirovahîye şoreşan pêkbîne û gelê Kurd jî vê bangê li ser milê xwe datîne, û hem erkîn xwe bi cihîne weke mirovekî erkardar.

Dîrok û dîsa dixwaze gelê Kurd li ser navê mirovahîye, şoreşa sîyemîn ava bike û berê bin axê, ya pergala netewa demokrat û xweseriya demokrati li Rojavayê Kurdistan pêk tîne, bi giyan û ramanehî komînal û mirovekî azadîxwaz, ya ku di pêşerojê de dê bibe nimûne ji bo tevâyî Rojhilatê Navîn.

Dema ez dixwazim herim dîrokê li xwe bigerim, armanca min ne bez û rev e, belê tiştî ne li gor dilê min li ser min hate sepandin û ferzîkirin. Cîma me ji bo her kesî kir û her kes bûn dijiminê me?

Leşkeren Sovyetê cîma ji Mehabadê xwe vekîsand? Û Qazî Mihemed hat darvekîn, û li ser daxwaza Kemal Ataturk gelê Kurd, herêma Nêxîşivan-Komara sor- Li Asya Navîn Stalînewindakirin, endamîn komela Xoyebûn li ser daxwaza, haman rayedarê Tirk Stalîn ew yek bi yek tevgera wan bê çalak kir. Cîma leşkeren Rûsyâ qeyserî pişti gîhiştin Serhed û Erzîrûmê bi alîkariya hêzên Kurd, dîjî dewleta Osmaniye dagirker, lê di dawîyê de xwes-tîngelê Kurdli wan herêmançir bikin, li ser daxwaz û pendê amûjgarênen xwe yê Ermenî de sala 1912an de.

Cîma Lînîn pêşengê Şoreşa Oktoper yê, ku helbestan û rewşenbîrên Kurdehî dîhelbest û berhemîn xwe de sermed kîrin, bûşixurê dewleta Tirk dema peyamîn rayedarên Kurdan

mîna Simko yê Şikakî, Tahayê Nehrî û Ebdirezaq Bedirxan û Qeyserî Rûsyî radestî dewleta Tirk kir û di encama vî karê qirêj de herdu lehengê Kurd Ebdirezaq Bedirxan û Tahayê Nehrî li ser destê Tirkan hatin darvekîn, lê Simkoyê Şikakî bitenê xerîzgarkir û berê xwe da nav Şikakan di Rojhilatê Kurdistanê de sala 1918an de. Em ji dîrokê re hê ci dibêjin!

Cîma Yonanistan û Tirkîyê dijîminâhiya hezarê salan, li ser dîlgirtina Rêberê gelê Kurd hemû jîbîr kirin. Gelê Kurd kengî û di kîjan qonaxa dîrokê de winda bû? Ango ji hundirê dîrokê derket.

Ezbawer nakim mirov karibe vê yekê destnîşan bike lê ez di wê baweryê de me ku mirov vê yekîdikarebişewyekîglemîprî şirove bike.

Miletê Kurd di xwezaya xwe de ya biyoljik, û her wiha di xwezaya xwe ya cografi de ji, miletêkî demokrat sincperwer e û ev yek

Helbestin Bijartî.. Şêrîn Bozan

Di 10/10 sala
1987an li gundê Qebaciq yê ku bi bajarê Kobanî ve girêdayî ye jidayik bûye.. zaroktiya xwe li gund derbas kir, hezkirina wê ji zimanê Kurdî re di riya ragihandina Kurdî re hat, û pir zehmetî di fêrkirina xwendin û nivîsa Kurdî de kişand.

Babîska Berî Xewê

Dirbûna te vê carê
Di asîmana giyana min de
Sîtîrk tune kirin
Û ez di eywanê
winda bûnê de şas kirim.
Ketim ber çepela reşbûnê
Û axînê tazî xwe li min
Durpêç kirin
Sîtîrk bextê jî
Ji min fedî kir
Û xwe vesart
Hat bîra min dema ku
Em li gel hev rûdîniştin
Û li asoyê tamaşê dikirin
Ku her ewrekî bi xwe re
Hêviyek rakirbû
Pişî ji xeyalan derketim
Min çavêن xwe dane hev
Û ez di bêdengiyê de
Raketim
2016/7/ 19

Keserek
 Ne tenê fînikên sibehê
 gulan dihejînîn
 Ew dengê dilê min jî
 hemî damarê
 jiyanê diqetîne
 Ü dihêle refîn
 perwanan berênen
 xwe bidin biyanîyê
 bê ku vegezin
 li paş xwe meyez kin
 ka ew dengê ci bû
 Ü koçberkirina xwe
 berdewam kirin
 bi ustiyê xwar

Bendewarê Gulê Me
 Xemgîn im bo wê gulê
 Ku di bîşkifandina xwe de hişk
 bû
 Ü te ji min re ne anî
 Sal zîvirî û ji nûva eşqînda
 Li benda te ma ku tu
 Ji min re bînî.

Bihna xwe belav kir
 Li dost û yaran
 Serxweş kir rîwî û bilbilan
 Û te ji min re neanî
 Ta ku pel bi pel weşîya
 Û bû tozek axî şewîti
 Û jiyanê jê bar kir
 Û li zemînê reşîya.
 Belki tova xwe
 Guleke siwî peyda bike
 Gelo wê demê ji min re bînî?
 Lê tu yê li ser dilaweriya xwe
 bîmînî
 Û dîsa ji min re nayînî
 Ez hîn hêvidara wê gulê me
 Ku tu bi tiliyên xwe bixînî
 Ber guhê min
 Û ramûsaneke perperikî
 Li rex wê daymî
 Û keziyên por jê re bi guldankî
 Wê demê tenê
 Ez ê ji bîr bikim
 Çiroka gula cilimî
 Bihna ku li hawîrdor geriyayî
 Ez di bêdengiyê de djîm
 Lê hebûna peydakirina giyana
 min hîn
 Bendewarê wê gulê ye
 Û serxweşa wê bîhnê ye
 Ew bendewar e
 Ez jî bendewar im
 2016/3/29

Di 15 saliya wê de malbata wê bar dîkin bajarê Reqayê, ûli wir zimanê Kurdî li gel wê dibe di asta yekem de berî zimanê Erebî, û di sala 2003an de dest bi nivîsa û helbesta kurdî dike.

Bedengî
 Ez nizanim
 Ci tê bîra min
 Ü ez li ser nivîna
 Ne xweşîyê me
 Lê di navbera tiliyên te
 tîrêja hêviyê
 Hezar gulan li ser
 Mijangê min diçîne
 Ü xwe ber dide nav
 qelşen rûyê min
 Ez ê wan gulan
 Bi xuya ku li ser laşê
 min bûye belbelîskê
 Baranê pê av bidim
 Ü bi porê xwe yî şîl
 tevna evînê pê
 Çêkim
 Ü bi hêşirê xwe yî
 Xilmaşî gerdenekê
 Çêkim û pê sîngê te
 Bixemlinim

Û li ser dêmîn xwe yî
 Çilmisî ramûsanan
 Ji te re rî kim
 De ka bi destekî
 Xuya eniyê min rîcke
 Û yê din jî di bin
 serê min ke
 Û bila dawiya vê nexweşiyê
 di hembêza te de be

Sefeq
 Şeفا ku asîman sor bû
 Ji şewq vedanbûna erdê
 Ku xwîn bibû golên avê
 Şeفا ku kund tê de
 Kûrekûr bû
 Lê Kobaniyan guh nedan
 Dengê wî
 Û bi çavên qerimî raketin
 Bi bawerkirina ku xwedê
 Wan diparêzeye
 Lê nizanibûn wê bi destê
 Yen dibin navê xwedê de
 Wek berxê bi kereke kov
 Werin şerjîkirin
 Şeفا qiyametê
 Di yasaya zirz û hovan de
 Miletî berîbûn tê binçavkirin
 Bê ku guneh karibin
 Guliyêñ jinan li şûnê man
 Ü tiliyâ şihadetê
 Ya kal û pîran
 Li ser xalîyê nimêjê man
 Bêdengiya xayin xwe berda
 Nav laşê tax û kolanan
 Ü di şefaqê de
 Bihna mirinê ji Kobaniyê
 Vejiya
 Edî kes nizane
 Kî hate kuştin
 Ü kî nehate kuştin
 Lê yê sax jî man,
 Bûn mirîşkên şerjîkirî
 Hilperbitin ji êş û janê
 Ü kelebox ji wan radibe
 Kobaniyan serên miriyê
 Xwe dane ber serê mala xwe
 Ü heyâ niha mirî û zîndî
 Bi giyanekî dijîn
 2016/6/25

Ramûsana Sêwî

her dem ew ramûsana
 xwe ber dide
 nav bîranîna min
 qırşikan davêje
 ser agîr dilê min
 hîn gur dike birîna tazî
 Û dihêle sîberên
 basik şikstî bifire
 li ezmanê bê deng
 de tu ji min ci dixwezî
 di dawiya vê şevê de
 ku tu bi hêşrên rojan
 vê bîranînê av didî
 ma edî nebes e
 ku tu ji nav
 bîranînê min barkî
 û konê xwe
 li cihekî din vegirî
 di nav buhareke nuh de
 va bîranîna bûye payîzeke pîr
 ta hêşîn li ser daran hilweşîyan
 edî min ji bînike
 ji bo ku ez dike deriyê
 bîranînê xwe
 bi qiflê hesinî kilit bikim
 û qelşen tê de siwax bikim
 bila tu carî
 tu li min venegerî

Nexşa Laşê Aşiqekê
 Di nav tiliyê te de
 ava westanbûne dimeşe
 Û li paş wan çiyan de
 roja hêviyê tîrêjîn

xwe ber dide nav
 newalê dil
 Ez parastmenda
 bîranînê
 te me
 Nexşa laşê min
 bê sînor e
 Ne pesport
 Û ne riya qaçax
 Pê gereke
 Lê ku tu hatî
 ji bîr meke bi xwe re
 bîne peyalek avî pîroz
 û kemçek xêzî şewîti
 Û berî ku tu bigîh min
 ji bîr meke bîhna
 asemînê bi xwe bireşîne
 Û fereştên di nav tîlîn
 porê xwe de berde
 Bihêt ez li benda te me

Nerîneke Eyendî

êdî peyv di nav talîzoka
 windabûnê de parce bûye
 zivistan jî derbas bû
 ma ne bes e ku
 giya serbest bibe
 ji bin keviran?
 û milê xwe bi bejna gulê de
 û peyv ji nuh ve
 bicive di goşeyekî
 buharê de
 Ü çiroka borî birêsinê
 Kerasê pêşerojê jî
 Li ser bejina xwe de berde
 Lê vê carê
 Wê çinik bi rengê buharê
 Werin dirûn
 û kemberekê ji gulên
 Qewanê bîhûnîn
 Pê newqa eyendê
 Bixemlinin
 Ü bêjî ji zivistana bêzar re
 Oxirbe

Di sala 2007an de qonaxa amadayî temam kir û pişte re bar kirin bajarê Helebê, li wir xwendina xwe berdewam kir ûdûv re derbasî zanîngeha Helebê, beşê Felsefê bû.

Te Nas Kir?

Lo... evîna welêt
 ne bi xişixa tizbiyê
 şêx û melan e
 û ne bi ala reş û bangkirina
 bin navê yazdan e
 û ne bi çek û rextê
 ku mirovatî dikujin
 û sinc û nirxan dikuhêrin
 evîna welêt bi hesanî
 tê naskirin
 bi bîhna axa Deyşta Sirûce
 bi çiroka Evdî û Edûlê
 tê naskirin
 bi govenda zerîyan
 li ser kaşê Miştenûr
 bi periyê ku çav
 di nav axa pîroz de
 dibîrçin tê naskirin
 evîna welêt
 bi germahiya hestê dil
 bi zanibûna tûrê li ser mil
 tê naskirin
 ma ez hîn bêjim Lo?
 lê evîna welêt
 berî sitanê min
 xwe berda nav hunavê te
 û tu agadar kirî
 ku evîna welêt pir



şêrîn e

-8-

Tabloyên Rewanî

-1-

di her şevê de
 di hembêza bêzariyê de
 dergûşek ji êşkenciyê dibe
 û çavên xwe
 Kerasê pêşerojê jî
 Li ser bejina xwe de berde
 Lê vê carê
 Wê çinik bi rengê buharê
 Werin dirûn
 û kemberekê ji gulên
 Qewanê bîhûnîn
 Pê newqa eyendê
 Bixemlinin
 Ü bêjî ji zivistana bêzar re
 Oxirbe

-2-

Zeviyêñ êşkênen min mehjîne
 belkî sinbilên wê
 ji hêviyan avis bibin
 êdî min bîriya
 sema û dîlanê kiriye
 Loo

-3-

bi bê dengî ez bîriya dikim
 û bi bîrkirina min hêlinê
 nuh dişewitin
 heyâ nikarim di guhê sitêrkan
 de jî
 bikime pistepist
 lê gaziya bilindji hundirê min tê

-4-

di hêsrêne te yî berîbûn de
 ez ayjeniyê dikim
 û di kûrbûna çavên te de
 li hêviyan digerim

-5-

min nedît sitêrka bextê
 çawa xwe veşart
 di berbangê de
 lê min dît tîrêja roja sor
 bi ci rengî xwe
 xemîland ji jiyanê re

-6-

Bi keziyêñ xwe
 ez ê kul û xeman bîhunim
 Di nav xelekên
 gûlî de jî
 Ez ê gulan biçînim

-7-

Di navbera herdû çavên te de
 Refek perwan firiyân
 Ü hatin li ser herdû
 lêvîn min rawestîyan

-13-

Li vî bajarî heyâ
 gulên sor tune ne
 Bîhna biyanî tenê
 ji taxêñ wê tê
 ma ez ci bikim

-14-

min rojiya evînê kirtiye
 û bi sifra bîranîn fitarê
 vedikim

Xwendina wê li zanîngehê bandor li zimanê wê yê Kurdî kir, û zimanê Erebî rola xwe li ser nivîsên wê list, lewre dest bi nivisandina bi zimanê Erebî jî kir. Niha bi her du zimanan dini-vîse.